Jixwe ev agahî wisa mimkûn e ku encax ji devê kesekî li kelehê hatibe girtin. Ev jî nîşan dide ku hin agahiyên di kronîka Îsken Beg da ji teref Kurdan ve hatine neqilkirin ku bi Xan ra di kelehê da bûne û yan piştî şer sax mane yan jî berî şerê rûbirû teslîmî Îranîyan bûne û Îskender Beg jî ji devê wan girtibe. Ji vir jî meriv pê derdixe ku ev rûdan ji hêla wan Kurdên di nav şer da, bi awayekî pir bi lez hatiye neqilkirin û belavkirin. Çimkî dema em berê xwe didin varyantên gelêrî em navên gelek kesayetên tarîxî jî dibînin. Di gelek varyantan da rasterast nav guherîbin jî temsîlên wan ên tarîxî her parastî ne. Bi heman rengî em ê di tehlîla metnan da jî bibînin ku Feqiyê Teyran jî di bin karîgerîya neqilkirinên gelêrî da menzûmeya xwe nivîsiye.

5 Ji bo agahiyên berfireh li wergêranên Tirkî yê çar kronîkan binêrin (Açar, 2019: 31-135). Ev kronîk ya yekem a Îskender Begê Munşî ya bi navê Tarîxî Alemarayê Ebbasî ye, ya duyem a Celaleddîn Muhemmed Yezdî (Molla Celal) a bi navê Tarîxî Ebbasî an jî Rûznameî Molla Celal e, ya sêyem a Mîrza Begê Cunabadî ya bi navê Ravzatu's Safewîyye ye, ya çarem a Fezlî Begê Huzanî Îsfehanî ya bi navê Efdalu't Tewarîx e. Dîsa ji bo agahiyên berfirehtir dikarin li xebata Ordîxanê Celîl (36-11 :2001) û Amir Hassanpour (405-404 :1995) jî binêrin.

Feqiyê Teyran û Menzûmeya Wî ya Bi Navê Kela Dimdimê

Di gelek mecmûe', antolojî, tarîxên edebîyata kurdî û gotaran da qala Feqiyê Teyran û jiyana û berhemên wî hatiye kirin. Lê hêj jî ji hin aliyan ve zelalîyeke tam çênebûye derheqê jiyana wî da. Piştî ku gora wî li Şandîsa Hîzanê hat kifşkirin, gelek agahîyên derbarê jiyana û berhemên wî da jî pê ra zelal bûn. Navê wî Mihemed e û weku Feqiyê Teyran navdar bûye û di manzûmên xwe da mexlesên weku "Mîm û Hê", "Feqî", "Mîr Mihê" û "Miksî" li xwe danîne. Sala bûyîna wî hê jî tam ne zelal e. Her çiqas li ser sala 971/1563an nêrîneke giştî hebe jî hin lêkolîner weku sala 957/1549an jî destnîşan kirine (Sadinî, 2012: 36-43; Yıldırım, 2014: 16). Lê eyan e ku ew li gundê Warezûr(z)ê li Miksê hatiye dinê û di sala 1041/1631an da li gundê Şandîsa Hîzanê wefat kiriye û li wir medfûn e. Piştî ku qebra wî di sala 2013an⁶ da peyda bû eşkere bû ku di sala 1117/1705an da hakimê Hîzanê Mîr Huseyînê kurê Mîr Şeref weqfiyeyek bo mesrefên gora wî damezirandîye û qebra wî daye çêkirin (Adak û yd., 2014: 111-119). Dîsa derbarê binemala wî da hêj jî agahiyeke teqez tune. Lê bi piranî lêkolîner ji ber mexlesa wî ya bi navê "Mîr Mihê" dibêjin ku ew ji malbata Mîrên Miksê kurê Mîr Ebdal bûye ku li gorî serdema jiyana Feqiyê Teyran û Mîr Ebdal ev yek ne dûrî aqilan e (Sadinî, 2012: 47-49). Hin lêkolîner jî ji benda dawîn a helbesta wî ya "Ordeka Ava Cizîrê" tê derdixin ku wî bixwe gotiye "ez ne ji mîran im ne xan im, Muksî yim bê xan û man im..." û mexlesa wî ya Mîr Mihê jî bi xeletîya nivîsîna mustensîxan ve peywendîdar dikin ku diviyabû "Mîm Mihê" ba (Yıldırım, 2014: 15). Di lêkolîneke Hanefî Taşkın (2016: 67) a li ser Mela Haşimê Miksî da ji şecereya devkî dîyar e ku Feqiyê Teyran ji malbata şêxan bûye û ji bav û kalên Mela Haşim tê hesêbê. Ew dema qala şecereya Mela Haşim dike dibêje ew kurê Mela Ehmedê Tînîsî ye. Mela Ehmed kurê Hecî Mela Mihemedê Tînîsîyê kurê Şêx Mûsayê kurê Mela Ebdurrehmanê Tînîsîyê kurê Hecî Êsivê Welîyê birayê Feqiyê Teyran e. Hecî Êsiv û Feqiyê Teyran jî kurên Mela Ebdullahê kurê Îmam Ustad Xelîlê Xalidî ne. Lêbelê Hecî Êsivê Welî gelo ji malbata Mîr Hesenê Welî ye an na tiştek nehatiye dîyarkirin. Loma li gorî me di vê lêkolîna Taşkın a behskirî da jî tam ne zelal e ka Feqî ji malbata şêx û muderisan e yan ji malbata mîran e.

Derbarê perwerdeya ku standî û dayî da tê zanîn ku Feqî li Miksê di Medreseya Mîr Hesenê Welî da dest bi xwendinê kiriye û li medreseyên Cizîr û Finikê dewam kiriye û li Finikê di Medreseya Mîr Nasir da muderîstî jî kiriye (Aykaç, 2022: 81). Heta Yıldırım (2014: 17) destnîşan kiriye ku Feqî menzûmeya xwe ya Kela Dimdimê li Finikê nivîsîye. Jixwe Ebdureqîb

6 Ji bo nûçeya peydakirina qebra Feqiyê Teyran binêrin: <https://www.ilkehaber.com/haber/feqiye-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm> (29.04.2022)

Yûsif (2012: 37-38) jî dibêje ku Feqî li Finikê gelekî maye û navê wî û Finikê bi hev ra derketiye.⁷

Li gorî Aykaç (2020: 335) Feqî li Cizîrê di bin hîmayeya mîrzadeyê Ezîzan, Xan Evdal da bûye û Xan Evdal wî vedixwîne û li Medreseya Mîr Nasir dike muderis û bi vî şikilî ji behra zanîn û hunera wî îstifade dike.⁸ Xan Evdal kurê Mîr Şerefê kurê Mîr Evdalê kurê Mîr Nasireddîn e. Deshtilatdarîya Mîr Şeref li Cizîrê di 1616an da diqede û tê gotin ku di sala 1610an da kurê wî Xan Evdal tê dinyayê û ji ber Xan Evdalê Mukrî navê wî li kurê xwe dike. Çimkî di kronîkên tarîxê da jî sabît e ku Emîr Xanê Biradostî alîkarî ji siltanê Osmanî Ehmedê I. dixwaze û li ser vê Siltan Ehmedê I. nameyek bo wî dişîne û soza alîkarîyê didê û heman nameyê digel fermanek rê dike bo Walîyê Wanê û mîrektîyên Kurdan ên li deverê (Eyûb Hesên, 2022: 17-22; Kaplan, 2019: 29).⁹ Tê gotin ku di heman demê da Mîr Şeref ji bo alîkarîya Emîr Xanê Biradostî û şerê li dijî Sefewîyan tê cem walîyê Erziromê Mûrad Paşa (Balûken, 2021: 59). Lê wisa xuyaye heya diçin alîkarîyê keleh dikeve û alîkarî pêk nayê. Bi vê yekê subût dibe ku wê çaxê haya Mîrê Botan/Ezîzan ji vê meseleyê heye û dixwaze biçê alîkarîyê jî.

Îcar ger em dîsa vegehin li ser peywendîya Xan Evdal û Feqîyê Teyran, li gorî Aykaç (2020: 336) wisa xuyaye ku wê demê Xan Evdal mîrzade bûye û li Finikê ji Feqîyê Teyran xwestiye ku li ser Kela Dimdimê menzûmeyek binivîse û Feqî jî li ser vê daxwazê nivîsîye û vê menzûmeya xwe jî îthafî Xan Evdal kiriye. Ya rastî dema meriv bala xwe dide menzûmeya Feqî, ev angaştî borî gelek di cih da ye ku belkî wê çaxê ev beytên jêrîn maqûltir mane bigirin di nav menzûmeya Feqî da:

Ez ji xîreta Nebî me
Ez şêrekî Mukrî me
Xan Ebdalê Bohtî me
Ez jî bi navê wî me

7 Derbarê jîyan û berhemên Faqîyê Teyran da ji bo agahiyên berfirehtir binêrin: (Sadîni, 2012: 111-109; Yıldırım, 2014: 13-35; Resûl, 1998: 82-96; Aykaç, 2020: 334-337; Adak û yd., 2014: 111-120)

8 Tam nayê zanîn Feqî kîjan salê hatiye Cizîrê. Lê em dizanin ku di sala 1616an da hakimîyeta Mîr Şerefê bavê Xan Evdal diqede û di şûna Mîr Şeref da kurê wî Muhammed Paşa û piştî wî jî kurê din ê Mîr Şeref ê bi navê Mîr Mehmûd dibe hakimê Cizîrê. Herwiha tê gotin ku Xan Evdal kurê din ê Mîr Şeref bi dexesîya birayê xwe ji hêla walîyê Erziromê Muhammed Paşa ve tê kuştin (bnr. Baluken, 2021: 59). Îcar Feqî bi hîmeyaya kîjan mîrî tê tam ne zelal e. Lê mimkûn e ku wê çaxê Xan Evdalê kurê Mîr Şeref li Finikê mîrzade be û li ber deştê Feqî ders girtibe. Çimkî li gorî çavkanîyan dema Feqî wefat dike di 1631an da Xan Evdal jî wê çaxê teqrîben 21 salî bûye.

9 Lê di vê nameyê da navê hejdeh mîr û mîrektîyan derbas dibe bes navê Mîrê Botan tune ye (bnr. Eyûb Hesên, 2022: 20).

Bohtan ev nav gerande
Babim bihîst hebande
Îna li min nihande
Bi vî navî ez jî xwende
(Feqiyê Teyran, 2014: 153-154)

Çimkî Feqî li vir ji devê kesê yekem vedigêre ku ew jî devê Xan Evdal e ku qiseta navê xwe dibêje. Herweku Feqî ji devê Xan Evdal qiseta navê wî neqil dike. Dîsa xaleke balkêş ji bo çavkanîya menzûmeyê divê malika “Bohtan ev nav gerande” bi baldarî bê xwendin ku li gorî me ji vê malikê tê famkirin ku wê çaxê rûdana Kela Dimdimê û navê Xan Evdalê Mukrî û hevalên wî yên şervan li Bohtanê di nav xelkî da geriyaye û li ser zar û zimanan belav bûye. Bêguman ev nîşanek e bo belavbûna destanê di nav gel da. Herweha di benda dawî ya menzûmeya xwe da Feqî ji xwîneran fatiheyek bo ruhê xwe û Xan dixwaze. Di vê bendê da hunereke kînayeyê heye ku qesda wî ji Xan sê xan in ku yê yekem Emîr Xanê Biradostî, yê duyem Evdal Xanê Mukrî û yê sêyem jî mîrzadeyê hamiyê wî Xan Evdalê kurê Mîr Şeref e:

Di paşî wan qîsan ra
Ji Nebî û ewliyan ra
Ji Mîm û Hê û Xan ra
Fatîhe ji rihê wan ra
(Feqiyê Teyran, 2014: 159)

Her bi çi awayî û di nav çi peywendê da hatibe nivîsîn jî piştî ku tarîxa mirina Feqiyê Teyran kifş bû em dikarin bibêjin pê ra zelal bû ku menzûmeya Kela Dimdimê jî wê nivîsîye. Çimkî heya wê çaxê jî gelek nîqaş û nezelalî li ser danerê vê menzûmeyê hebûn.¹⁰

Menzûmeya Kela Dimdimê ya Feqiyê Teyran a herî kevin di koleksiyona A. Jaba ya destxetan a Leningradê da parastî ye. Di vê koleksiyonê da du destxetên cuda yên Kela Dimdimê hene û yek ji van di nav destxeta Kurd 26 da û ya din jî di nav destxeta Kurd 36 da hatiye parastin ku ev her du destxet jî weku mecmûeyên helbestan hatine îstinsaxkirin. Jixwe her du varyant jî gelek nêzî hev in ku çawa Celîl (2001: 42) jî gotiye mimkûn e mustensîxê van her du destxetan jî yek bin. Di destxeta Kurd 36 da menzûmeya Kela Dimdimê bi tevahî di şeş rûpel û çar wereqan da hatiye bicihkirin ku ji wereqa 33a heya 36b dewam dike. Di wereqa 33a di serê menzûmeyê da qeydeke wiha hatiye danîn: “Hikaya Şerê ser Keleya Dimdimê digel Qizilbaşan Goftê Feqî Teyran”. Ev menzûme di destxeta Kurd 26 da jî di heft rûpel û

10 Ji bo wan nîqaşan binêrin: (Sadîni, 2012: 58; Resûl, 1998: 87; Celîl, 2001: 42-44)

çar wereqan da bi cih bûye. Ji wereqa 15a destpê dike heya nivê wereqa 18a dewam dike. Lê ne di serî da ne jî di temmetê da derbarê navê Feqî da tu agahiyek tune. Di temmetê beyteke bi Erebî hatiye danîn ku bi vî rengî ye:

أمر على المقابر كل يوم
* ولم اعلم بأي أرض قبري
أفرح كل ما يزداد مالي
* ولم ابك على نقصان عمري

Ez her roj di ser qebran ra diborim
Lê nizamim ku dê li ku be qebra min

Her ku malê min zêde dibe kêfxweş dibim
Lê li ser kêmbûna umrê xwe nagrîm”
(Kurd 26: wr. 18a)

Lêbelê bend û honandina her du menzûmeyan yek e. Menzûme bi giştî ji 67 bend û 268 rêzikan pêk hatiye û bi vê bendê dest pê dike:

“Helal kiriye Tahayê,
Mezhebê ve bi kêr nayê
Em dimrin nayêne rayê
Axret xweştir e ji dinyayê”
(Kurd 36: wr. 33a)

Bi vê benda jêrîn jî temam dibe:

“Di paşî wan qisan ra
Ji Nebî û ewliyan ra
Ji Mim û Hê û Xan ra
Fatîhe ji ruhê wan ra”
(Kurd 36: wr. 36b)

Dîsa nusxeyek jî ya di Dîwana Feqiyê Teyran da ye ku Xalid Sadinî bo çapê amade kiriye û Sadinî (2012: 94) dibêje ku wî metna Kela Dimdimê ji Kovara Dengê Me wergirtiye. Îcar ji metnê bixwe jî dîyar e ku ew jî ji ber van destxetên di koleksiyona A. Jaba da hatiye transkrîbekirin.

Heya vir me derbarê metna Kela Dimdimê û peywendîya wê ya bi Feqî ra nixand û destnîşan kir. Derbarê naverok, tema û vegêrana vê menzûmeya Feqiyê Teyran da em ê di sernavên jêr da bi berfirehî qal bikin.

Varyantên Gelêrî Yên Kela Dimdimê ku Mijara Vê Xebatê ne

Rûdana Kela Dimdimê di sala 1609an da rû daye û di sala 1610an da temam bûye. Her çiqas careke din di serdema hakimiyeta Kelb Elî Xanê Afşar da di navbera wî û Temir Xanê kurê Emîr Xanê Biradostî da di sala 1629an da şerekî nû li Kela Dimdimê derketibe (Açar, 2019: 147-148) jî ji şerê ewil û pê ve di nav Kurdan da rûdan, cengawerî û şervaniya Emîr Xanê hevalên wî li ser zar û zimanan belav bûye. Helbet di hin varyantan da em karîgerîya şerê Kelb Elî Xanê û Temir Xanê jî li ser varyantên devkî yên Kela Dimdimê dibînin.¹¹ Lê belavbûna destanê di nav Kurdan da kifş e ku pir zû çê bûye û li seranserê Kurdistanê hatiye bihîstin û neqilkirin. Ev yek hem ji aliyê rûdanên tarîxî ve pêkan e ku wê demê peywendîyeke xurt a mîrên Kurdan hebûn¹² hem jî weku erdnîgarî Kurdistanê û danûstandina Kurdanê ticarî, civakî, ajelvanî (koçerî) rê li pêşîya vê pir zû vedikir. Li gorî me du nîşaneyên din ên belavbûna bilez a destanê ya di nav xelkî da hene. Nîşaneya yekem, di kronîka tarîxê ya Îskender Begê Munşî da carinan em dibînin ku Îskender Beg hin malûmatên derbarê kelehê da yan jî derbarê amadekariyên şerî yên di çepera Emîr Xanê Biradostî da ji devê Kurdan neqil kiriye ku ev yek nîşan dide ku Kurd hakimê meseleyê bûne û tiştê ku jiyane neqilî derdora xwe kirine. Yek jî em rasterast di menzûmeya Feqîyê Teyran da dibînin ku li wir îşaretî belavbûna vê meseleyê ya li Botanê dike ku ew qisim wiha ye:

Ez ji xîreta Nebî me
Ez şerekî Mukrî me
Xan Ebdalê Bohtî me
Ez jî bi navê vî me
Bohtan ev nav gerande
Babim bihîst hebande
Îna li min nihande
Bi vî navî ez jî xwende
(Feqîyê Teyran, 2014: 153-154)

Dema dibêje “Botan ev nav gerande, Babim bihîst hebande” pir eşkere ye ku qesd ji Botanê xelkê Botanê ye ku di nav xwe da vî navî (Xan Ebdalê Mukrî) û helbet qiseya wî gerandine û Mîr Şeref jî bihîstiyê û li ser wê, navê

11 Bi taybetî di teqandina kelehê da em dibînin ku jin barûtxaneyê diteqînin piştî têkçûna Kurdan. Ev rûdan ji aliyê tarîxî ve piştî şerê Şah Ebbas û Emîrxanê Biradostî di şerê Kelb Elî Xanê û Temir Xanê da pêk tê. Lê em di gelek varyantên gelêrî da dibînin ku ev mesele tê vegêran. Ev jî nîşan dide ku ji aliyê gel ve şerekî yekparçe hatiye dîtin û wisa hatiye vegêran. An jî bi demê ra varyantên tîkel bûne û weku yekparçe gihîştine roja me.

12 Ji bo peywendiyên mîran digel hev û bi Kurdên parçeyên din ra binêrin (Aykaç, 2020).

kurê xwe Xan Evdal danîye.

Îroj dema em bala xwe didine berhevkarî û xebatên folklorîk ên li ser Kela Dimdimê, em dibînin kurt û dirêj, kêr û zêde, tekûz û nîvco gelek varyant hatine berhevkirin û tomarkirin. Ji xebatên berhevkarîyê yê Mela Mehmûdê Bazidî bigirin heya yê oryantalîstên weku Eugen Prym, Albert Socin, Oscar Mann di dawîya sedsala 19an û serê sedsala 20î da û helbet gelek kurdzanên weku Heciyê Cindî, Qanatê Kurdo, Casimê Celîl, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Cemîl Ahmed Zêro Herkî, Mihemed Tewfîq Wirdî, Reşo Zîlan, Yasîn Hesên Goran, Yaşar Kaplan û gelekên din bi dehan varyantên vê destanê berhev kirine û çap kirine.¹³

Em ê di vê xebata xwe da ji nav bi dehan varyantên gelêrî du varyantan esas bigirin. Yek jê varyanta ku Prym û Socin ji devera Botanê anku Elqûşa Duhokê berhev kirine û di sala 1890î da li Petersburgê weşandine. Varyanta din jî berhevkarîya Yaşar Kaplan e ku wî di eslê xwe da deh varyantên cuda ji deh beytbêjên devera Hekarîyê berhev kirine û ji ber van varyantan varyanteke tekûz danîye û sala 2015an lêkolînek li ser kiriye û di sala 2019an da jî çap kiriye.

Varyanta Prym û Socin (1890: 180-201) bi navê “Dimdim” hatiye tomarkirin û weku têbînîyek tê gotin ku ev menzûme ji Elqûşa Duhokê hatiye berhevkirin û ji aliyê Kurdekî ve jî hatiye xwendin û sererastkirin û paşê hatiye weşandin. Herwiha di vê têbînîyê da hatiye destnîşankirin ku menzûme bi devoka Mukriyan hatiye vegêran, lêbelê tê da guherînên zimanî pêk hatine. Menzûme bi giştî 530 rêzik in û rêz di nav xwe da bi serwa ne. Le serwaya rêzan ne yekreng e. Gelek caran weku “aaa” “aab” “aba” yan jî çar rêz û pênc rêz “aaaa”, “aaba” rêz dibin. Kêşeke hevqirtî nîne bêtir di navbera 7, 8, 9 û 10 kîteyan da rêzik hatine ristin. Lê rêzik bêtir li ser 7 û 8 kîteyî rêz bûne. Destan bi temamî menzûm e. Giringiya vê varyantê ew e ku berhevkarîyeke kevin e û weku çavkanîyeke sereke tê qebûlkirin. Ev varyant bi van rêzikan dest pê dike:

“gulmîne leb gulmîne,
gellî xelkê û-alemîne,
bo we bikim keste Xanê Lebzêrîne.”
(Prym & Socin, 1890: 180)

13 Ji bo agahiyên bêtir derbarê xebatên li ser Kela Dimdimê da (çi berhevkarî çi lêkolîni) li xebata Ordîxanê Celîl (2001: 37-52) a bi navê *Kurdskiy Geroyîçeskiy Epos “Zlatorukiy Xan”/ Kîrt Kahramanlık Deştani “Altın Elli Han (Deştana Lehengî ya Kurdan “Xanê Lepzêrîn”)*, xebata Reşo Zîlan (2015: 193-195) a bi navê *Lêkolînek li ser Kela Dimdimê*, xebata Yaşar Kaplan (2019: 16-18) a bi navê *Deştana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn*, xebata Cafer Açar (153-157) a bi navê *Safevi Kroniklerinde Dimdim Kalesi Kuşatması ve Emir Han Bradostî*, binêrin.

Bi van rêzikan jî temam dibe:

“dê billezin, billezînin,
Barûtê li e’rdê bireşînin,
Esker têgda biqelînin,
Batinne dêma berînin.”

(Prym & Socin, 1890: 201)

Li gorî hin varyantên din an jî varyanta ku Yaşar Kaplan berhevkirî, ev varyant kême maye û temam nebûye. Jixwe di têbinîyê da berhevkar jî vê temamnêbûnê destnîşan dikin (Prym & Socin, 1890: 181).

Varyanta ku Yaşar Kaplan berhevkirî weku me berê jî got ji deh varyantên kurt û dirêj hatiye saz kirin. Navê “Destana Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn” lê hatiye danan. Bi temamî nêzîkê heftsed bendî ye. Li gorî zincîreya rûdanê dabeşî heft sekansan bûye. Ji aliyê şikilî ve (serwa, kêş, bend) dişibe varyanta Prym û Socin. Lê ev varyant pexşan û menzûm têkelhev e. Girişîya vê varyantê ew e ku di nav varyantan da ya herî bi tafsîlat û dirêj e. Herweha ji serî heya dawî ya herî tekûz e. Bêguman tesîra destkarîya Yaşar Kaplan di vê da heye. Yanî di eslê xwe da varyanteke saz kirî ye. Lê ne ku destkarîyeke li eslê vegêrana beytbêjan be.¹⁴ Ev varyant bi van rêzikan dest pê dike:

“Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne
Qeseta Xanê Lepzerîn e”

(Kaplan, 2019: 57)

Bi van rêzikan jî temam dibe:

“Hey Dimdimo kavî û wêran
Meskenê piling û şêran
Rovî lê d’ken geşt û gêran
Rehmet day û babêd guhdêran”

(Kaplan, 2019: 154)

Kifş e ku her du varyant jî şibhî hev dest pê dikin. Lêbelê weku hev naqedin. Di varyanta Kaplan da digihêje encamekê û beytbêj bi gotineke formulî diqedîne. Di varyanta din da weku me gotî vegêran bixwe jî kême dimîne û encama teqez ne ‘eyan e.

Di vê xebatê da em ê van her du varyantên gelêrî bi menzûmeya Feqiyê Teyran ra di çarçoveya vegêrannasiyê da berawird bikin û tîpolojîya

14 Ji bo agahiyên bêtir derbarê îcrakirin û rûxsara vê varyantê binêrin: (Kaplan, 2019: 18-20).

vegêrana wan û xalên ku li ser zûr bûne kifş bikin.

Karakter

Karakter heyînek e ku di nav çîrokekê (rûdanekê) da cih digire û di nav alema sêwirandî da hin erkan pêk tîne û di tevgerê da ye. Karakter û peywendîya wan a digel mirovan di jîyana rasteqîn da û di alema sêwirandî de, texmînkirina karakteran ji aliyê xwîner û guhdêran ve, rabirdûya karakteran, karakter weku leheng, cureyên karakteran, karakterîzasyon û herwiha peywendîya karakteran bi zîncîreya rûdanê ra çend xalên hewceyî nirxandinê ne da ku meriv baştir karakteran binase.

Di menzûmeya Feqiyê Teyran a Kela Dimdimê da bi giştî karakter dibin du par. Para yekem karakterên binavkirî ne weku Xanê Zêrînzende, Xan Ebdal, Şah, Xelîfe, Kiça Xan, Xan Edhem. Para duyem ew karakter in ku bi navên temsîlî yên weku Qurcî, 'Ecem, Rom, Bohtî, Mîr, Xelk (Em) hatine binavkirin.

Qurcî ne tê da hemû karakterên din di eslê xwe da weku mirovan hatine teswîrkirin. Jixwe wisa tê famkirin ku Qurcî binavkirina hin karakterên fantastîk in ku weku xeybî yan jî şervanên mûcîzewî têne nasandin. Kes nizane ew kî ne û herweha hejmara wan bêhesêb in anku nayên hejmartin. Teswîrên fîzîkî yên karakterên mirov bi awayekî berfireh nehatine kirin. Yanî ji aliyê bejn û bal, rabûn û rûniştin û jiyana rojane ya kesayetana ve nehatine şayesandin. Bêtir şayesandin û karakterîzasyona wan li ser helwest û sekna wan û reftarên wan ên li dijî hev hatine kirin. Herweha weku du alî hatine nîşandan ku yek jê terefgirên heq in weku Xanê Zêrînzende, Xan Ebdal, Kiça Xan, Qurcî, Rom, Bohtî, Mîr, Xelk (Em). Herweha ev karakter û lehengên baş/protagonist in. Li hêla din karakter û lehengên xerab/antagonist hene weku Şah, Xelîfe, Xan Edhem û 'Ecem ku ew dijmin in. Karakterên protagonist bi pênaseyên weku rûsipî, şehîd, cindî, biîman, şêremerd, şêrekî bêmişal, pehlewan, xîretkêş, bêzirav, nazik, qewî bi sû, aza û xazî hatine karakterîzekirin. Karakterên antogonist jî bi pênaseyên weku kafir, beraz û dilqewî hatine karakterîzekirin. Hem di menzûmeya Feqiyê Teyran da hem jî di varyantên gelêrî da dualiya misilman û kafir heye û amaje pê tê kirin. Lê di menzûmeya Feqî da rasterast sedema şerî ferqa mezhebî ye ku ev di seranserê karakterîzekirina hemû karakteran da xuyaye. Bêguman ne bi qasî Feqî be jî ev karakterîzasyon di varyantên gelêrî da jî heye.

Hûrgiliyên jiyana rasteqîn a karakteran tuneye. Herwiha qala rabirdûya karakteran jî nehatiye kirin ka ew berê kî bûn, çî kes bûn û peywendîyên

wan digel hev çî bûn. Bêtir karakterên rast û tîpîk in. Ne karakterên girover û guherbar in. Karakter an li ser rêya heq û wêrek in an jî jirêderketî û xerab in. Weku leheng Xanê Zêrînzende û Xan Ebdal xuya ne. Lê di menzûmeya Feqiyê Teyran da eyan e ku ji Xanê Zêrînzende bêtir qala Xan Ebdalê Mukrî hatiye kirin ku ev berevajî varyantên gelêrî ne.

Di her du varyantên gelêrî da dîsa meriv dikare karakteran bike du par. Lêbelê ne bi şikilê misilman û kafir, bi şikilê Kurd û 'Ecem ev dabeşî mimkûn e. Li hêla Kurdan navê Xanê Lebzêrîn/Lepzêrîn¹⁵, Ebdal/Avdel Xanê Mukrî(yan)¹⁶, Temir/Teter Xan, Avdel/Ebdal Beg, Qeroyê Bêdkarî û Kanûnî¹⁷, Mehmûdkê(ko) Alekanî (Melekanî), Dêya Xan (Le'î Xan), Bûka Xan (Perî)¹⁸, Mela (Teyîbo), Xewsê Bexdayê (Şex Ebdilqadirê Geylanî) derbas dibe. Dîsa weku Batinî û Ewliya karakterên ku ne mirov in jî di behsê da ne. Di nav van karakteran da Mehmûdkê Alekanî ne tê da karakterên din bi giştî protagonist in. Mehmûdê Alekanî bi pênaseyên weku bê şerm û fihêt, xulam, se, ji nesl û cinsê şeytan, xaîn, xerîm, babnemayî û bablêmirî tê karakterîzekirin. Karakterên mayî yên li hêla Kurdan bi pênaseyên weku dilsoz, zane, durnasê binê behran, xweşmêr, şêr û piling, melkemot, binamûs, bitedbîr, camêr, pak, durist, dîndar, tolhildêr û serbilind (qebûlnekirina bindestiyê) hatine karakterîzekirin û herweha bi çavê Şahî pêşî weku xulamekî amin û paşê jî weku nankor, xayîn, dijminê dîn hatine karakterîzekirin.

Li hêla 'Eceman navê Şah Ebbas/Abas (Şahê 'Ecem)¹⁹, Xelîfe²⁰, Mîr Seîd derbas dibe. Ev karakter bi pênaseyên weku kafir, bêusûl, hesûd, fesad hatine karakterîzekirin.

Ji ber ku şerê Kurd û 'Eceman e dema behsa vecemîna artêşa 'Eceman

15 Ev nav di her du varyantên gelêrî da jî heye. Ji bilî vî navî Xanê Zêrîndeşt, Xanê Çengzêrîn, Xanê Kurdan, Xanê Sor, Xano, Mîrxan jî ji bo heman lehengî hatiye gotin.

16 Navê Xanê Mukrî jî carinan weku Xanê Sor, Xan Ebdal û Xanê Mukrî(yan) derbas dibe.

17 Ev her du karakter di varyanta Kaplan da derbas dibin û qasid, xweşmêr û fedaiyên Xanê Lepzêrîn in.

18 Di her du varyantan da jî derbas dibe û weku keça Şah Ebbas tê nasandin û jina Ebdal Begê kurê Xanê Lepzêrîn e. Di varyanta Prym û Socin da tu agahiyek ku ew keça Şah Ebbas e tuneye.

19 Bi piranî wek Şah derbas dibe. Lê di her du varyantan da jî navê Şah Ebbas hatiye gotin.

20 Navê Xelîfe di her du varyantan da jî derbas dibe. Di varyanta Prym û Socin da Xelîfe weku sedrazamê şah tê nîşandan û kesê ku fesadiyê di navbera Xan û Şah da dike Mîr Seîd e. Herwiha karakterekî bi navê Xelîfe jî di dawiya vegêranê da diyar dibe. Lêbelê di varyanta Kaplan da kesê ku fesadiyê di navbera Xan û Şah da dike Xelîfe bixwe ye. Herweha Xelîfeyê ku di dawiya vegêranê da tê kuştin jî wisa xuyaye ku heman Xelîfe ye. Di menzûmeya Feqî da jî Xan Edhem pêşengê artêşa Şah e û Xelîfe di dawiyê da xuya dibe.

tê kirin qala Xanên Tewrêz, Xwêyo²¹, Selamast, Erûvêl²², Kîncûmînc²³ dikin di varyanta Prym û Socin da û li beramberî wan dîyar e ku li benda alîkariyeke ji hêla Kurmancan ve lê tu alîkarî naxuyê. Di varyanta Kaplan da ji bilî yên me hejmartî Xanên Tehran, Şino û Seblax, Êrmiye û çend cihên ku nayên zanîn tam ku der in weku Berê Koxê, Gaza Berî, Hoderî, Henc û Mance, Berê Birî, Behra Girî jî tevilî artêşa 'Eceman dibin û beramberî wan Xanê Lepzêrîn bi Mela Teyîbo kaxez dide nivîsandin û Mîrê Dihokê, Paşayê Wanê, Mîrê Mûşê, Hekarîyê, Cizîrê, Zaxoyê, Mûsilê, Mîrkê Zêbarê vedixwîne alîkariyê û tu encamek jê dernayê. Di menzûmeya Feqî da Rom, di varyanta Prym û Socin da Kurmanc û di varyanta Kaplan da jî ev Mîrên Kurdan in. Lêbelê ev ne karakterên di nav vegêranê da ne. Bi tenê temsîliyet in.

Di varyantan da karakterên leheng Xanê Lepzêrîn û Xan Ebdalê Mukrî ye û li beramberî wan jî Şah û Xelîfe ne. Derbarê rabirdûya Xanê Lepzêrîn û Şah da hin agahî hene. Berî rûdanê derbarê wan û peywendîya wan da agahî hene û paşê behsa veguherîna wan dike. Di varyanta Kaplan da ev agahî bêtir û berfirehtir in. Xanê Lepzêrîn ji ku bû, ji ku rabû hat û çawa bû xulamê Şah û hwd. Xanê Lepzêrîn karakterekî guherbar e û girover e û zûbizû nayê texmînkirin. Lê yên din kêr û zêde tèn texmînkirin û tîpîk in.

Dema meriv rûdana Kela Dimdimê dabeşî qadên karakteran bike tabloyeke weku ya jêr pêk tê. Li gorî vê tabloyê meriv dikare hin manendî û cudahîyan bi vî rengî rêz bike. Di serî da du qad di menzûmeya Feqî da kêr in ku yek jê qada fesad e ya din jî qada xayîn e. Di menzûmeya Feqî da Xan Ebdal weku lehengê sereke digel Xanê Zêrînzende xuyaye. Di qada mutefiq da hevterîbîyek di navbera vegêranan da heye. Bes ferqa temsîliyeta Kurdan di varyantên gelêrî da bêhtir derdikeve. Di her du vegêranan da jî xeybî xuyane, lêbelê navên wan guherîne. Ev qada xeybî nîşaneyek e ku Feqî di nivîsandinê da di bin karîgerîya varyantên gelêrî da maye. Herçiqas di qada jinan da karakter û navên wan biguherin jî dîsa hevterîbîyek di nav wan da heye. Wisa xuyaye rola jinan a wêrekane di rûdana Kela Dimdimê da bûye foksîyoneke binyatger. Di qada şervanan da ferqa herî beloq ku di varyantên gelêrî da bi dehan çaran şervan weku Kurd tèn bilêvkirin. Esil ne di dabeşkariya karakteran da di gotara vegêranê da ev ferq xuya dibe. Vê yekê jî vegêrana Feqî bêtir nêzî pevçûneke mezhebî kiriye û yên gelêrî jî nêzî pevçûneke neteweyî kiriye.

21 Qesd jê Xoy e.

22 Qesd jê Erdebîl e.

23 Me pê dernexişt ku der e.

Tablo 1: Parvebûna Karakteran di Menzûmeya Feqî û Varyantên Gelêrî da

	Lehengê Sereke		Fe-sad	Muttefiq		Xey-bî	Xayîn	Jin	Şervan	
Menzûmeya Feqî	X a n ê Z ê r î n - z e n d , X a n E b d a l ,	Şah	Tune-ye	Rom, Bohtî	X a n E d - h e m , X e l î f e	Qurcî	Tune-ye	K i ç a X a n , S i t î	Xelk (Em)	'Ecem
V a r - y a n t ê n G e l ê r î	X a n ê L e p z ê r î n ,	Şah	Xelife, M î r S e î d	X a n E b d a l ê M u k r î , K u r - m a n c , M î r ê K u r d a n	X a n ê n E c e - m a n , X e l î f e ,	B a - t i n î , E w l i - y a	M e h - m û d ê A l e - k a n î	D ê y a X a n (L e ' l î X a n) , X a n P e r î (B û k a X a n) , S i t î	Kurd	'Ecem

Zincîreya Rûdanê

Rûdan bi giştî weku binyatekê tê hesabandin ku bûyer û aksiyon li ser ava dibin. Ev binyat dibe ku pir sade û basît an jî pir aloz û têkilhev bê honandin. Ji ber vê taybetîya wê ye ku di analîza vegêranekê da hewcedarî bi parçekirin û jihevqetandina binyatî çêdibe. Jihevqetandina herî basît ew e ku her rûdanek ji destpêkek, girêyek û encamekê pêk tê. Lêbelê analîzên kûr ên li ser rûdanê tenê bi jihevqetandineke bi vî rengî pêk nayên û divê skeleta rûdanê bi giştî bê dîtin.

Di menzûmeya Feqî da em vegêranê dikarin dabeşî deh paran bikin. Para serî û dawî weku formelên destpêk û dawîyê ne ku berî derbasî aksiyona rûdanê bibe Feqî heya benda heftem herwekî amanc û sedema şerî dîyar kiriye ku 'Ecem mezheba xwe li ser Xanê Lepzêrîn û xelkê Kela Dimdimê ferz kirine û Xan û ehlê wî jî vê qebûl nakin. Ji rûdanê bêtir ev qisim ravekarîya rewşa berî rûdanê ye. Di her du bendên dawî da jî Feqî weku formeleke xelaskirinê ya qesîdeyên klasîk doza duayê ji bo şehîdên Kela Dimdimê, xwe û her sê Xanan dike ku ev bixwe jî ji rûdanê berî ye. Dîsa parek jî gişt li ser şayesandin û derbirîna hestên Feqî yên li ser rewşê ye ku ev der ji benda 37an heya benda 40î ye. Di vê parê da jî rûdan radiweste û li vir em bêtir dengê Feqî dibihîzin ku hîsên xwe yên li ser dîmena şerî vediguhêze. Loma em dikarin bibêjin rûdan di nav 7 paran û 54 bendan da tê vegêran. Feqî ji benda 7an heya benda 11an qala amadekariya şer a Xanê Zêrînzend û xelkê Kela Dimdimê dike. Ji benda 12an heya benda 13an qala sefera 'Ecceman a li ser kelehê û dorpeçkirina wê dike. Ji benda 14an heya

benda 24an qala destpêka şer û pevçûna roja yekem dike. Ji benda 25an heya benda 29an qala gurrbûna şer û nehatina emanê ji hêla Romê dike. Ji benda 30yî heya benda 36an qala teşbîha navê Xan Ebdalê Mukrî û Xan Ebdalê Botî dike û herweha qala biryara derketina ji kelehê bo şerê rûbirû dike. Xisûsen ji benda sihî heya benda sih û çaran rûdan hebki radiweste. Çimki di wan bendan da teswîra nav û teşbîha navê her du Xan Ebdalan tê kirin. Feqî ji benda 41an heya benda 60î qala rûbirûbûna her du alîyan û şerê wan ê rûbirû û şehîdbûna Xan û şervanên wî dike. Di para dawî ya rûdanê da jî Feqî behsa wê yekê dike ku 'Ecem berê xwe didine jinên di kelehê û li vir qala teqandin û wêrankirina kelehê ji hêla keça Xan ve dike ku hem bi ser xwe da hem jî bi ser leşkerên 'Ecem da kelehê tînin xwarê. Ev para dawî dibe encama şerî û rûdan kuta dibe. Esil li gorî tarîxê teqandina mezin a kelehê di şerê duyem ê di dewra Temir Xanê kurê Xanê Lepzêrîn da pêk tê ku ew jî li gorî qeydên tarîxê dibe sala 1629an. Em dizanin ku Feqî di sala 1631an da wefat kiriye. Loma pirseke wiha tê hişê mirovan: "Gelo Feqî vê menzûmeyê piştî sala 1629an nivîsiye?"

Di menzûmeya Feqî da rûdan bi awayekî kronolojîk bêyî dana hûrgiliyan bi pêş dikeve û digihêje encamê. Girêya rûdanê di serî da çê dibe ku ew jî ferzkirina mezheba 'Eceman li ser Xanê Lepzêrîn û ehlê kelehê ye. Piştî vê her ku diçe ji bo girê bê çareserkirin ji her du alîyan tevger pêk tên û di dawiyê da bi têkçûna kelehê girê çareser dibe. Bêguman di rûdanê da aliyê Xan û Kela Dimdimê hemû dimirin û bi awayekî fîzîkî têk diçin. Lêbelê serînetewandin û digel xwe têkbirina 'Eceman bi gelek zirar û ziyanan û herî dawî rûxandina kelehê bi serê wan da weku biserkeftineke manewî tê nîşandan û ji aliyekî din ve jî girêya arêşeyê çareser dibe.

Di her du varyantên gelêrî da ji aliyê pêşketin û sekansên rûdanê ve cudatîyên wan hene û varyanta Prym û Socin jixwe tam neqediya. Dîyar e ku ew nîvco maye. Loma ez ê li vir zîncîreya rûdanê ya varyanta Kaplan esas bigirim û ger cudahiyeke varyanta din jê hebe destnîşan bikim.

Kaplan bixwe jî rûdanê dabeşî heft sekansan kiriye û di serî û dawîya vegêranê da formela destpêkê û dawîyê heye. Di varyanta Prym û Socin da formela destpêkê hema hema eynî ye lê ji ber ku tamam nebûye em rastî formela dawîyê nayên di vê varyantê da. Di sekansa ewil da qala Xanê Zêrîndest û eslê wî û hevnasîna wî û Şah Ebas tê kirin. Di varyanta Prym û Socin da qala hevnasîna wan nayê kirin lê peywendîya wan tê kirin. Di sekansa duyem da qala peydakirina xezîneyê/gencîneyê û destpêka veqetîna Xan ji Şah tê kirin. Di menzûmeya Feqî da qebûlnekirina mezhebê dibe sedema pevçûnê ku di varyanta gelêrî da jî herçiqas rasterast wisa neyê

gotin jî yê ku biryara veqetînê bi Xan dide Xewsê Bexdayê Şêx Ebdilqadirê Geylanî ye. Şêx Ebdilqadir şêxekî sunîyan e û pêşnîyaza xezayê dide Xan ku maneya xezayê şerê li dijî kafiran e. Lê di vê sekansê da ferqa menzûmeya Feqî û ya gelêrî ew e ku di ya Feqî da 'Ecem li Xan û ehlê wî zorê dikin û li dijî wan biryara pevçûnê didin. Di varyanta gelêrî da jî bêyî ku Şah haya wî ji vî tiştî hebe Xan li cem xwe wê biryarê dide. Piştî vê sekansê di sekansa sêyem da qala plansazî û avakirina kelehê û şayesandina wê tê kirin. Di sekansa çarem da dorpêç û destpêka şer û berxwedana Xan tê vegêran. Di varyantên gelêrî da sedema şer û pevçûnê bi du şikilan tê nîşandan. Yek jê pêhesîna Şah e ku Xan li dijî wê tevdigere û ya din jî serînetewandina Xan a li hemberî Şah e. Piştî ku Şah doza serînetewandinê dike û Xan qebûl nake dorpêç û şer dest pê dike. Di sekansa pêncem da qala sefera şexsê Şah bixwe tê kirin û herwiha gurr û giranbûna şer tê neqilkirin. Di sekansa şeşem da qala berevajîbûna şer û çarenûsa Xan tê kirin ku ew li hemberî Şah lawaz dikeve û herwiha behsa emanxwestina Xan a ji mîrên Kurdan û Batinîyan jî di vê sekansê da ye. Di sekansa heftem da jî qala têkçûn û wêranbûna Kela Dimdimê û dawîlêhatina şer tê kirin. Di varyanta Prym û Socin da ev sekansa dawî nîvco dimîne. Berî ku têkçûna aliyê Xan pêk bê û keleh wêran bibe varyant bi dawî dibe.

Di varyantên gelêrî da jî bi awayekî kronolojîk rûdan dest pê dike û bi dawî dibe. Kêm û zêde hem menzûmeya Feqî hem jî varyantên gelêrî dibin heft sekans. Ferqa sekansên gelêrî ew e ku gelek bi hûrgilî hatine neqilkirin. Herweha ji ber binyata vegêrana gelêrî ye ku hin sekansên varyanta gelêrî di menzûmeya Feqî da tunene ku me di tabloya jêr da berawird û destnîşan kirine. Li gorî vê tabloyê sekansa Xanê Zêrîndest û eslê wî, sekansa peydakirina gencîneyê û veqetîna Xan ji Şah, sekansa plansazî û avakirina kelehê di menzûmeya Feqîyê Teyran da tunene. Li gorî me ev ji bo teşeyê menzûmeyê ne guncav e û bo dirêjbûnê sînorek jê ra lazim e. Loma Feqî wan sekansan lê zêde nekiriye. Yek jî hin motîfên gelêrî yên weku peydakirina gencîneyê, ceribandina lehengîya Xan û hwd. di van sekansên ewil da derbas dibin ku mimkûn e tu rastîyeke wan tunebe û bi tenê weku motîfên gelêrî hatibin sêwirandin. Loma mimkûn e ji ber vê egerê Feqî di menzûmeya xwe da cih nedabe van motîfan û bêhtir bi serborîya tarîxî xwe sînor kiribe. Bêguman ferqa vegêrana nivîskî û devkî jî tesîrê li vê yekê kiriye. Yanî herçiqas Feqî ji devê xelkê yan jî ji derdorê xwe bihîstibe jî dema derbasî nivîsê kiriye di nav teşeyeke taybet da bi şêwazeke taybet li gorî xwe honaye. Ev bi giştî dibin egera tunebûna van her sê sekansên ewil di menzûmeya Feqî da. Îcar divê em destnîşan bikin ku her sê sekansên ewil ên di menzûmeya Feqî da di sekansa çarem a varyanta gelêrî da bi cih dibe.

Herwiha sekansa çarem û pêncem a menzûmeya Feqî teqabulî sekansa pêncem û şeşem a varyanta gelêrî dike û dîsa sekansa şeşem û heftem a menzûmeya Feqî teqabulî sekansa heftem a varyanta gelêrî dike. Yanî xuyaye ku çi kurt û dirêj di menzûmeya Feqî da her sê sekansên ewil ên varyanta gelêrî ne tê da yên din bi giştî hene. Ji aliyê lihevkirina van vegêranan bi kronîkên tarîxê ra jî bêhtir menzûmeya Feqî xwerû ye û varyantên gelêrî dîyar e li ser zar û zimanên xelkê hin motif û sekansên nû û zêde lê hatine barkirin ku ev bixwe jî dîsa ferqa çanda nivîskî û devkî nîşanî me dide.

Tablo 2: Sekansên Rûdanê di Menzûmeya Feqî û Varyantên Gelêrî da

	Sekansa Yekem	Sekansa Duyem	Sekansa Seyem	Sekansa Çarem	Sekansa Pêncem	Sekansa Şeşem	Sekansa Heftem
Menzûmeya Feqî	Amadekariya şer a Xanê Zêrînzend û xelkê Kela Dimdimê	Sefera ‘Eccemana li ser kelehê û dorpêckirina wê	Destpêka şer û pevçûna roja yekem	Gurrbûna şer û nehatina emanê ji hêla Romê û hatina Şah li nav şerî	Derketina ji kelehê bo şerê rûbirû	Şerê wanê rûbirû û şehîdbûna Xan û şervanên wî	Teqandin û wêrankirina kelehê
Varyantên Gelêrî	Xanê Zêrîndest û eslê wî û hevnasîna wî û Şah Ebas	Peydakirina gincinyê û destpêka veqetîna Xan ji Şah	Plansazî û avakirina kelehê û şayesandina wê	Dorpêç û destpêka şer û berxwedana Xan	Sefera şexsê Şah bixwe û gurr û giranbûna şer	Berevajîbûna şer û çarenûsa Xan û emanxwestina wî	Têkçûn û wêranbûna Kela Dimdimê û dawilêhatina şer

Dem û Cih

Her vegêranek ji bo ku pêk bê muhtacê demê ye. Bêyî demê ne rûdanek pêk tê ne jî ew rûdan tê vegêran. Lewma di her vegêranekê da du cure dem hene ku yek ji wan dema rûdanê (story time) ye. Yanî ew bûyera ku rûdide di nav kronolojîyêke demê da rû dide. Ya din dema gotarê (discourse time) ye. Yanî bi alîkarîya ziman di vegêranekê da ji bo ku ew rûdan li mûxatebekî bê neqilkirin, hewcedarî bi demê heye. Vê yekê teorîsyenên Alman weku dema çîrokê (erzählte Zeit) û dema vegêranê (Erzählzeit) dabeş kirîye (vgz. Genette, 2011: 21).

Di kronîkên tarîxê da sabît e ku rûdana Kela Dimdimê ji payîza sala 1609an dest pê kiriye heya havîna 1610an dewam kiriye ku ev teqrîben

nêzî heft heşt meh in. Ger meriv danûstandinên Şah û Xan weku arêşe derketina vê meseleyê lê zêde bike dibe ku ev dem bigihêje salek û du salan jî.

Dema em bala xwe didin menzûmeya Feqî, tenê li ser pêkhatin û dawîbûna şer sekinîye. Herçiqaş di serî da amaje bi zordarîya ‘Eceman bike ku dixwazin mezhebê xwe bi Xan û ehlê wî bidin qebûlkerin jî ev zordarî ji kengî ve dest pê kiriye û çiqas dewam kiriye nehatiye gotin. Ji aliyê demê ve em sê îşaretan di menzûmeyê da dibînin. Nîşaneyê ewil di serî da behsa qebûlnekirina mezhebê kafiran tê kirin ku dîyar e ev berî şer dest pê bike weku nîqaşek li cem Xan û ehlê wî peyda bûye û piştê Xan digihêje biryarekê û Feqî vê biryarê bi vî rengî neqil dike:

Şehîd bin terka dinê kin
Navekî ji xwe ra çêkin
Bes e Kelê asê kin
Rabin vêk ra hewlê kin
Rabû Xanê Zêrînzend e
Subhê vekir derbend e
Xelqê cindî dixwend e
Reşandin ‘enber û qend e
Zêr û xil’et da wan e
Kamil ku bû dîwan e
Go: “Herçî biîman e
Subhê werine meydan e”
(Feqîyê Teyran, 2014: 150)

Di van sê bendan da ewil biryar tê dayîn ku di rêya Xwedê da şehîd bin û şerê ‘Eceman bikin. Lê nehatiye nîşankirin ka dayîna vê biryarê çiqas kêşaye. Piştî biryar dayînê Xan radibe rojek paşê derbendên kelehê vedike û di nav vê maweyê da kes û karên xwe di kelehê da dide hev ku nayê zanîn ka vê çiqas kêşaye. Piştî ku dîwan kamil dibe careke din tê gotin ku sibe roja şer e û yê ku dixwazin şehîd bin û xwedî îman bin bila werine meydanê. Dîsa piştî vê seremonîya dîwanê tê gotin ku “Subhê çûne ‘Ecem e” û dîyar e li vir qala sefera ‘Eceman dike ku çiqas kêşaye nîşan nedaye û dema ‘Ecem çav bi kelehê dikevin ku ji nû ve ava kirîye, dest bi şer dikin ku ev şerê yekem e û heya Êvarê didome û biryara bêhnvedanê didin heya sibe:

Bi hîle û bi lêp e
Wan kuştin bê hisêb e
Lazim dê yek yekê be
Go: “Bes e heta sibe”
Subhê çûn eresatê

Xelqê di vê bîsatê
Kafir lê dikin xebatê
Hatine bin Kelatê
(Feqîyê Teyran, 2014: 153)

Ji van her du bendan tê famkirin ku şerê ewil rawestayê û sibetirê qonaxa duyem a şer dest pê kiriye. Di qonaxa duyem da behsa hatina ‘Eceman a bin kelehê, nehatina hewarê ji bo Xan ji hêla Romê, biryara şerê rûbirû û derketina ji kelehê û têkçûn û wêranbûna kelehê tê kirin lê ev bi gotina Feqî subehê radibin dikin û çiqas dewam kiriye nîşan nedaye. Tiştê balkêş ew e ku li sê deran dema qonax û sekansên rûdanê ji hev diqetîne peyva “subehê” ya ku demeke berfireh digire nav xwe vedigêre. Dema ku sekansa şerê rûbirû dest pê dike bi peyva “duhê” behsa berxwedana li kelehê tê kirin. Yanî ji hêla dema rûdanê ve nezelaîyek di menzûmeya Feqî da eyan e û tam ne dîyar e rûdan kengî qewimîye û çiqas kêşaye.

Ji hêla dema vegêranê ve di menzûmeya Feqî da du teknîk derdikevin pêş ku ev jî bi zûrbûn (dîtin) û vegêr (axaftin) ra peywendîdar e. Li hin deran Feqî ji dema xwe ya ku tê da ye behsa rûdanê dike û hin agahiyên vedigêre û bi dîtina xwe bi teknîka çîrokbêjekî dibêje weku mînak:

Hemiyên rayek vekir
Go aferîn ehda te kir
Avêtin tac qebûl nekir
Li ser xatira Ebûbekir
(Feqîyê Teyran, 2014: 149)

Li hin deran jî bi çavên karakteran dibîne û bi devên wan dipeyive her weku dîyalogan ku di wir da dem hevterîb e:

Qurcî di bê hisêb in
Pirs û pirsîyar ne êb in
Hûn dê mêvanê kê bin?
Aza di rêya Xwedê bin.
Aza di rêya Xwudah bin
Emê di pir gunah bin
Mêvanê Xelîfê Şah bin
Xazî di rêya Îlah bin
(Feqîyê Teyran, 2014: 156)

Li hin deran jî rûdanê radiwestîne û hest û hîsên xwe derdibirine. Mese-la dema ku biryarê didin ji kelehê derkevin biçin şerê rûbirû, Feqî behsa sitîyên li kelehê dike û hestên xwe bi vî rengî vedigêre ku li vir rûdan radiweste:

Hêstirêd min ji hûr tèn
Nalînêd min ji dûr tèn
Ji dax û kovanêd sûr tèn
Xelqo, ji daxê kûr tèn
(Feqîyê Teyran, 2014: 155)

Di varyantên gelêrî da dema rûdanê bi hejmareke formel weku “heft salan” nîşan didin. Esil hejmara heft di vegêranên gelêrî da tê maneya “kamilbûna demê” (Walî, 1379: 10-11). Loma ji gotina heft salan ji maweyekê bêtir weku gihiştina wê demê û an jî hatina wext bê şîrovekirin maqûltir e. Di her du varyantên gelêrî da jî heft sal di gelek deran da derbas dibe weku heft sal geryana Xan a welat bi welat, heft sal xulamîya Xan bo Şah, heft sal avakirina kelehê, heft sal dewamkirina şer û hwd. Loma weku demeke zelal a rûdanê di varyantên gelêrî da jî tune. Ji ber ku rûdan gelek bi hûrgilî hatiye vegêran, gelek teknîkên demê yê vegêranê weku kurtkirin, qevaztin û dubarekirin hatine bikaranîn. Herwiha ji bilî diyalog û teswîran dema kêşayî dema borî ye ku jixwe çîrokbêj di serî da pozîsyona xwe ya li rûdanê bi van rêzikan dîyar dike:

Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne
Qiseta Xanê Lepzêrîn e
(Kaplan, 2019: 57)

Xano çûbû nug Şaye
Bo xo lê diket lavaye
“Erd bide min qasî çermê gaye
Da bo xo lê bikim avaye
(Prym & Socin, 1890: 181)

Cih li gorî pozîsyona heyîn û kesan wateyê digire yan jî xuya dibe. Çawa ku dem kronolojîyeke rûdanê pêşkêşî me dike, cih jî derfeta tesbîta heyîn û kesan dide me (Kıran & Kıran, 2007: 249) ku her mexlûqek mecbûr e di cihekî da xuya bibe. Lewma jî her heyînek bi sê alîyan weku berayî, kûrahî û dirêjahî di valahîyekê da bi cih dibe (vgz. Ryan, 2009: 430). Lê ji ber ku di deqên edebî da cih ne bi awayekî fîzîkî û dîtbarî, bi awayekî devkî ango zimanî tê pêşkêşkirin, pîvana cihî jî xeyalî û farazî dimîne. Îcar li gorî Ryan (2009: 421-425) dema ku mirov nixandina cihê vegêranekê kir, bes divê mirov bi çavekî wisa lê nenêre ku ew tenê ji bo bicihkirina karakteran çarçoveyek û ji bo pêkhanîna rûdanan valahîyek e.

Di menzûmeya Feqî da meriv bi sê cihan dihese yek jê cihê ku rûdan lê qewimîye ku ew jî Kela Dimdimê ye û herwiha welatê Xan e. Cihê din welatekî dûrî Keleha Dimdimê ye ku tu navek lê nayê kirin lê welatê 'Ece-man e. Çimkî 'Ecem ji cihekî dûrî wir derdikevin seferê. Cihê din jî cihê Feqî û îcraker an jî nivîskarê menzûmeyê ye ku li du sê cihan amaje bi Botan û nêrîn û helwesta wan a vî şerî dike ku li wir di eynî demê da cihê xwe jî eşkere dike. Ji bilî cihê rûdanê em her du cihên din ji vegêrana Feqî derdixin. Çimkî dîyar e ku Feqî wê çaxê li ku ye û bi çi sebebî ev menzûme nivîsiye. Cihê din jî bêguman ji peyva 'Ecem tê texmînkirin ku welatê wan û yên Xan ne yek e. Bi vî rengî cihê ku Feqî lê dibe cihê vegêranê û her du cihên din jî cihê rûdanê ne.

Di varyantên gelêrî da kifşa cih hebki cudatir e. Berî her tiştî cihê vegêranê ne dîyar e. Çimkî vegêr (îcraker an jî çîrokbêj) ne kifş e. Lê qala gelek cihên rûdanê tê kirin. Cihê ku Xan lê ji dayîk bûye weku Hizarcot hatiye binavkirin ku ev der li gorî Kaplan (2019: 57) gundek e li devera Akrê li nav Zêbarîyan.²⁴ Cihekî din Îsfehan e ku ew jî cihê Şah e û Xan bi qasî heft salan xulamiya Şah dike li wir. Cihekî din Kela Dimdimê ye ku ew welatê Xan e ku jê ra hatiye mizgînkirin. Esil rûdan pareke mezin li Kela Dimdimê rû dide û li wir bi dawî dibe. Ji bilî van cihên sereke gelek dekor jî hatine şayesandin di varyantên gelêrî da weku cihê gencîneyê, mêşeya ku şer lê veşartî, cihê nêçîrê û hwd.

Li gorî tabloya jêr dema rûdanê di her duyan da jî ne zelal e ku ev yek menzûmeya Feqî nêzî vegêranên gelêrî dike. Çimkî em dizanin di vegêranên nivîskî da bi awayekî nîşana dema rûdanê tê danîn an jî bi şikleki mimkûn e bê hesabkirin. Lêbelê di menzûmeya Feqî da tu agahiyek bo vê yekê nîne. Tenê hin qalibên berfireh ên weku "subhê" û "duh" hatine neqilkirin. Ev yek bo me karîgerîya vegêranên gelêrî ya li ser menzûmeya Feqî nîşan dide. Cudahiyêke dema vegêranê ya menzûmeya Feqî heye ku ew jî ji ber kifşbûna nivîskarê berhemê ye. Herwiha ji aliyê dema vegêranê ve di her du vegêranan da jî teknîka kurtkirin û qevaztinê gelek hatiye bikaranînin. Xisûsen van herdu teknîkan di menzûmeya Feqî da em bêhtir dibînin. Jixwe ji ber vê ye ku zêde bi hûrgilî û dirêj nehatiye sêwirandin.

Di cihê rûdanê da zêde ferqekî mezin nîne. Çimkî rûdan parake xwe ya mezin li Kela Dimdimê derbas dibe ku du her du vegêranan da jî ev xuyaye.

24 Bi vî navî mimkûn e qismen cihê vegêranê bê texmînkirin. Lê dîsa jî ne bi awayekî teqez. Ev der di varyanta Kaplan da derbas dibe. Di varyanta Prym û Socin da ne cihekî bi vî rengî ne jî cihê çêbûna Xan derbas nabe. Di vê varyantê da cihê sereke Keleha Dimdimê ye û ji vegêranê jî meriv tê digihe ku welatê Şah e ku ew weku Tewrêz, Xoy, Selmast û hwd. tê hejmartin. Bêguman ev nav jî nîşanî me didin ku cihê rûdanê li mintiqeya Îranê ye.

Belkî ya herî muhîm li vir cihê vegêranê ye ku di menzûmeya Feqî da ev aşkera ye ku Botan e. Hem mayîna Feqî ya li Botanê hem jî pênivîsandina vê rûdanê ya Xan Ebdalê Bohtî û digel hin amajepêkirinên cihê xwe ev kifş dibe. Di varyantên gelêrî da jî ev ne dîyar e.

Tablo 3: Dem û Cih di Menzûmeya Feqî û Varyantên Gelêrî da

	Dema Rûdanê	Dema Vegêranê	Cihê Rûdanê	Cihê Vegêranê
Menzûmeya Feqî	Ne zelal e û dema borî	Dema Feqî (niha) û Dema Borî	Kela Dimdimê Welatê 'Eceman	Botan
Varyantên Gelêrî	Ne zelal e û dema borî	Dema Borî	Hizarcot, Îsfehan (welatê Şah), Kela Dimdimê	Ne dîyar e

Motîf

Motîf hêmana herî biçûk a vegêranê ye. Weku gotin û sembolên qalib-girtî ji hêla çîrokbêj û dengbêjan ve li gorî rûdana vegêranê di nav zincîreya rûdanê da tîn bicihkirin. Danerê vê binyatê Stith Thompson e ku îndekek jî ji bo vê amade kiriye. Lê ew tenê li ser vegêranên devkî xebitîye û îndeksa xwe ya motîfan li gorî wan vegêranan amade kiriye. Em ê di bin vî sernavî da bêtir li menzûmeya Feqî hûr bibin ka gelo motîfên ku di varyantên gelêrî da peyda dibin di menzûmeya Feqî da jî peyda dibin an na. Bi vî rengî dê manendî û cudahiyên menzûmeya Feqî û varyantên gelêrî bêtir bîn dîtin.

Di menzûmeya Feqî da herçiqas em rastî hin motîfan bîn jî ferqa wê û varyantên gelêrî ji hêla hebandina motîfan ve pir eşkere ye. Bêguman ev yek jî karîgerîya çanda nivîskî û gelêrî ye ku xwe di her du vegêranan da nîşan daye. Helbet di menzûmeya Feqî da xuyana motîfan kêmtir e. Lê dema em bala xwe didinê em dikarin di bin sernavên motîfên "Derasayî (F)", "Îmtihan (H)", "Civak (P)", "Xelat û Ceza (Q)", "Ayîn (V)", "Taybetmendiyên Karakteran (W)", "Hejmarên Formel (Z)" da çend motîfan peyda bikin.²⁵

Di bin sernavê derasayî da motîfa Qurcî ku weku aferîdeyên derasayî û mucîzewî (F200-F699) hatiye pênasêkirin, di menzûmeya Feqî da xuyane. Di bin sernavê îmtihan/ezmûnê da îmtihana ehlê Kela Dimdimê ye ka dê gelo çi bertekê bidine mezhebê dijmin ku ev weku peywirekî û pêkanîna peywirê (H950-H999) hatiye pênasêkirin. Jixwe vê peywirê qebûl dikin û dest bi şerekî bêeman dikin. Di bin sernavê civakê da çend motîf hene ku yek jê Xanê Zêrînzende û Xan Ebdal e ku weku mîrektî û esaletê (P0-P99)

hatiye pênasekirin. Xisûsen Xan Ebdal di vê xalê da gelek derketiye pêş. Bo nimûne peywendîya Xan Ebdal û Xanê Zêrînzende weku peywendîya du serekên civakê (P200-P299) hatiye pênasekirin ku di şerê rûbirû da ev xuyaye. Tifaqa di nav civakê da (P700-P799) motîfeke din e ku hem Xanê Zêrînzende xelqê di kelehê da dicivîne û li wir tifaqekê datînin û hem jî tifaqa Mîrê Botan û ehlê wî ku hazir e biçe şerî nimûneya vê motîfê ye. Weku motîfa kevneşopî û tore (P600-P699) jî qebûlnekirina mezhebeke din a Xan û ehlê Kela Dimdimê ye ku di menzûmeya Feqî da pir zal e. Di bin sernavê xelat û cezayê da jî motîfa xelatên manewî (P600) heye ku Xan û ehlê Kela Dimdimê rûreşî û bêîmaniyê qebûl nekirin ku di encamê da xelata şehîdbûnê wergirtin. Sernavê ayîn di menzûmeya Feqî da cihekî giring wergidire û xisûsen motîfa teswîrên li ser mezheb û ayînan (V300-V399) ku 'Ecem weku kafir, beraz û necis tên teswîrkirin. Karakterên di menzûmeyê da ji hêla mîrxasî, wêrektî, xîret, îman û sedaqetê ve hatine şayesandin ku ev weku taybetiyên baş ê karakteran (W0-W99) û weku sedaqet (W34) hatine pênasekirin. Sedaqeta li mezheba xwe û qebûlnekirina bêîmaniyê ya Ehlê Dimdimê, pênaseya Xan Ebdal a li ser ziravqetîne ku weku şerm dibîne û dilsozî, fedakarî û wêrektîya Kiça Xan ku digel xwe kelehê diteqîne û wêran dike, nimûneyên vê motîfê ne. Weku motîf hejmarên formel (Z71) di nav menzûmeya Feqî da zêde xuya nînin. Bi tenê li çend deran hejmarê hezar tê dubarekirin.

Di her du varyantên gelêrî da em rastî gelek motîfan tên û dikarin di bin sernavên motîfên "Ajel (B)", "Qedexe (C)", "Derasayî (F)", "Îmtihan (H)", "Zane (J)", "Berevajîbûna Çarenûsê (L)", "Tayînkirina Dahatûyê (M)", "Şans û Bext (N)", "Civak (P)", "Xelat û Ceza (Q)", "Zayend (T)", "Xwezaya Jiyane (U)", "Ayîn (V)", "Taybetmendiyên Karakteran (W)", "Hejmarên Formel (Z)" da van motîfan peyda bikin.

Hin ji van motîfan di bin sernavê motîfa tayînkirina dahatûyê (M) da dicivin. Ev motîf dikarin wiha bîna rêzkirin: bazarkirin û soz (M200-M299) weku xwestina erd a Xan bi qasî çermê gayî ji bo avakirina welatek bo xwe, motîfa kehanetê (M390) weku şîret û pêşniyaza Şêx Evdilqadirê Geylanî ya ji bo dahatûya Xan û motîfa xewnê (M300-399) ku melayekî tebîra xewna Xan dike û paşeroja wî pê dide hesandin. Di bin sernavê motîfa şans û bext (N) da ev motîf peyda ne: motîfa xewn an jî dîtina gencîneyê (N530) û motîfa qezayên bisiud (N400-N699) weku barîna berf û baraneke bêhesab ku nedihate hêvîkirin. Di bin sernavê motîfa Ajel (B) da motîfa şêr (B.740) weku hêza mezin û ecêb a ajelan xuya dike. Di bin sernavê motîfa Qedexeyê (C) da motîfa qedexeya axaftinê (C400-C499) weku qedexeya ku Xan li şivan

danîye ku xewna dîtî ji kesî ra nebêje. Dîsa qedexeya ku danîye pêşiya Mela ku tebîra xewnê ji kesî ra nebêje di nav vê motîfê da hesêb in. Di bin sernavê motîfa derasayî (F) da motîfa aferîdeyên derasayî (F200-F699) weku batinîyên ku têne alîkarîya şer xuya dibe. Dîsa motîfa kuştina cinawiran ji hêla zilamê bihêz/leheng ve (F628.1.0.1) weku kuştina şêrî ji hêla Xan ve motîfeke din e di bin vî sernavî da. Di bin sernavê motîfa îmtihan/ezmûnê (H) da motîfa ezmûnkirina wêrekî û lehengîya Xan (H1561.6) ji hêla Şah ve bi rêya cinawirekî weku Şêr motîfeke vî sernavî ye. Di bin sernavê motîfa zane (J) da motîfa zîrektî (J1100-J1699) weku avakirina keleheke hewqas asê ji hêla Xan ve xuyaye. Dîsa motîfa tevgerên bizanîn (J200-J1099) di bin vî sernavî da ye ku yek jê Dêya Xan/Le'îlî Xan bi hin tecrubeyên xwe rê dide pêşiya Xan. Motîfa din a di bin vî sernavî da xwestina erd bi qasî çermê gayî ya ji hêla Xan ve ye. Di bin sernavê berevajîbûna çarenûsê (L) da xanê xulam dibe xanê hakim û mîrê Kurdan (L200-L299) ku li vir dîlnizmîya xan tê xelatkirin. Herwiha keleh û berxwedaneke saxlem û asê û serxwebûna Xan ber bi têkçûnê diçe ku ev jî mimkûn e weku (L500) bê destnîşankirin. Di bin sernavê motîfa civakê da statûya Xan (P0-P99) weku mîr û hakimê Kurdan motîfek e. Peywendîya Xan û lawikên wî, jina wî, dêya wî, mîrên din ên Kurdan weku malbat (P200-P299), zarok û dê û bav (P230) û têkiliyên din ên civakê (P300-P399) hatine pênasekirin. Rola jinan a di civakê da, tifaq û bêtifaqîya di nav civakê da du motîfên vî sernavî ne ku weku civak-motîfên curbicur (P700-P799) dikarin bîn destnîşankirin. Motîfa mêrxasîya şervanan û motîfa qebûlnekirina bindestiyê weku kevneşopî û tore (P600-P699) di bin motîfa civakê da dikarin bîn destnîşankirin. Pîrbûna motîfên di bin sernavê civakê da hem di menzûmeya Feqî da hem jî di varyantên gelêrî da nîşaneyê wê yekê ye ku ev destan neynika civakê ye. Di bin sernavê motîfa xelat û cezayê (Q) da motîfa destê zêrîn weku lehengî/camêrîya xelatkirî (Q40) hatiye destnîşankirin. Dîsa parastina şeref û namûsê û navê Kurdayetîyê û herwiha mayîndebûna navê Xan heta hetayê weku motîfa xelatên manewî (Q600) hatiye destnîşankirin. Motîfeke muhîm a ku di menzûmeya Feqî da tune ye, lê di varyantên gelêrî da gelek derbas dibe xayîntîya Mehmûdê Alekanî û cezayê miqabilî wê ye ku weku du motîfan bi navê xayîntîya cezakirî (Q261) û cezayên xedar (Q450) xuyaye. Çimkî cezayên ku didin Mehmûdê Alekanî cezayên gelek xedar in. Di bin sernavê motîfa zayend (T) da motîfa namûsê heye ku namûsa mecazî ya parastina welat e ku meriv dikare weku (T700) destnîşan bike û herwiha parastina namûsa bûka Xan, jina Xan li gorî varyantan diguhere ku ew jî weku motîfa namûs û keçkanî (T300-T399) dikare bê nîrxandin. Di bin sernavê motîfa xwezaya jiyanê (U) da nepejirandina bindestiyê û bêedaletîya di navbera 'Ecem û

Kurdan da weku motîfa newekhevîyên jiyânê (U0-U99) dikare bê destnîşankirin. Di bin sernavê motîfa ayîn (V) da dua û encama wê weku hatina batinîyan, barîna berf û baraneke zêde ya ne di wextê da weku motîfên dia û nimêj (V50), hêza derasa a duayê (V57), armanca duakirinê (V59) û pejiwandina duayê (V59) dikare bê destnîşandikirin. Herwiha teswîrên li ser mezheban ên weku kafir di bin motîfa bawerîyên mezhebî (V300-V399) da hatiye destnîşankirin. Di bin sernavê motîfa taybetmendîyên karakteran da weku karakterên baş û nebaş meriv dikare cuda bike. Di menzûmeya Feqî da karakterên nebaş ne di asta karakteran da weku di asta teswîreke giştî ya 'Eceman da hatibû nîşandan. Loma li wir tenê motîfa karakterên baş xuya dibû. Lêbelê di varyantên gelêrî da hem motîfa karakterên baş hem jî motîfa karakterên nebaş xuayaye. Mêrxasî, wêrektî, xîret, camêrî, dilnizmî û sêdaqeta Xanê Zêrîndest, Xan Ebdalê Mukrî, şervanên Kurd ên di kelehê da, jinên li kelehê û Dêya Xan (Le'îlî Xan), Bûka Xan, her du şervanên dilsoz Kanîn û Qare weku motîfa taybetîyên baş ên karakteran (W0-W99) û sêdaqet (W34) hatiye destnîşankirin. Motîfa karakterên nebaş jî weku quretî, fitnebazî, hesûdî û xayîntîya Şah, Xelîfe, Mîr Seîd û Mehmûdê Alekanî di bin motîfa taybetîyên nebaş ên karakteran (W100-W199) û motîfa hesûdî (W181) da hatine nirxandin. Motîfa hejmarên formel jî gelek zêde ye ku ev jî ferqeke berçav a menzûmeya Feqî û varyantên gelêrî ye. Di varyantên gelêrî da hejmara heft (Z71.5), sê (Z71.1), çil (Z71.12) weku heft sal, sê roj û şev, çil roj û çil şev xuyane.

Tablo 4: Motîf di Menzûmeya Feqî û Varyantên Gelêrî da

Sernavên Motifan	Menzûmeya Feqî	Varyantên Gelêrî
Ajel (B)		Ajelê bihêz: Şêr
Qedexe (C)		Qedexeya Axafînê: Xan li Şivan û Mela qedexe dike ku xewnê nebêjin
Derasayî (F)	Aferîdeyên derasayî: qurcî	Aferîdeyên derasayî: batinî; Hêza derasayî: Kuştina şerekî bihêz ji hêla Xan va
Îmtihan (H)	Berteka ehlê Kela Dim-dimê	Ezmûnkirina lehengî û wêrekîya Xan
Zane (J)		Zîrektî: Avakirina kelehê; Tevgerên bizanîn: Rêberîya Dêya Xan, Xwestina erdî bi qasî çermê gayî
Berevajîbûna Çarenûsê (L)		Xelata dilnizmîyê: xanê xulam dibe xanê hakim; Têkçûna rewşê: Rewşa ezamet têk diçe

Tayînkirina Dahatûyê (M)		Bazarkirin û soz: xwestina erd a Xan bi qasî çermê gayî; Kehanet: şîret û pêş-niyaza Şêx Evdilqadirê Geylanî; Xewn: tebîra xewnê
Şans û Bext (N)		Xewn û dîtina gencîneyê; Qezayên bi-siûd: barîna berf û baraneke bêhesab
Civak (P)	Mîrektî û esalet (Xanê Zêrîzende û Xan Ebdal); Tifaqa civakê: tifaqa ehlê kelehê, tifaqa Xan Ebdal, tifaqa Mîrê Botan û ehlê wî; Kevneşopî û tore: nepejirandina mezhebeke din	Statû: Xanê Kurdan; Têkiliyên civakê: têkiliya Xan û malbatê, tekiliya Xan û mîrên din ên Kurdan; Civak-motîfên curbicur: tifaq û bêtifaqiya ehlê Kela Dimdimê û Kurdan, rola jinan; Kevneşopî û tore: mêrxasîya şervanan û qebûlnekirina bindestiyê
Xelat û Ceza (Q)	Xelatên manewî: şehîdbûn	Lehengîya xelatkirî: destê zêrîn; xelatên manewî: parastina şeref û namûsê û navê Kurdayetiyê û mayîndeb3una navê Xan heta hetayê; Xayîntîya cezakirî: Mehmûdê Alekanî tê cezakirin; cezayên xedar: Mehmûdê Alekanî dixin serê topê û davêjin kelehê.
Zayend (T)		Namûsa mecazî: parastina nav û şerefê; namûs û keçkanî: parastina namûsa kiç an jina Xan
Xwezaya Jiyanê (U)		Newekhevîyên jiyane: nepejirandina bindestiyê û bêedaletîya di navbera 'Ecem û Kurdan da
Ayîn (V)	Teswîrên li ser ayîn û mezheban: 'Ecem weku kafir, beraz û necis	Dua û nimêj: Xan û ehlê kelehê dua dikin; Hêza derasa a duayê: hatina batinîyan; Armanc û pajirandina duayê; Bawerîyên mezhebî: teswîra li ser mezheba 'Eceman weku kafir

Taybetmendîyên Karakteran (W)	Taybatîyên baş ên karakteran: dilsozî û wêrekiya Kiça Xan, mêrxasî û sêdaqeta Xan Ebdalê Mukrî, îman, xîret û sêdaqeta ehlê kelehê	Taybetîyên baş: Mêrxasî, wêrektî, xîret, camêrî, dilnizmî û sêdaqeta Xanê Zêrîndest, Xan Ebdalê Mukrî, şervanên Kurd ên di kelehê da, jinên li kelehê û Dêya Xan (Le'î Xan), Bûka Xan, her du şervanên dilsoz Kanîn û Qare; Taybetîyên nebaş: quretî, fitnebazî, hesûdî û xayîntîya Şah, Xelfe, Mîr Seîd û Mehmûdê Alekanî
Hejmarên Formel (Z)	Hezar	Heft, sê, çil

Temayên Sereke

Tema di metnekê da mijar, gotar û derbirîna sereke ye. Bi piranî di metnekê da temayeke sereke heye û gelek babetên din li dor temaya sereke dicivin û weku temayên têrker erka xwe pêk tînin. Dîyarkirina temayê di şîrovekirin û nirxandina maneya metnê da karê xwîner hêsan dike û dike ku meriv baştir li ser meqsed û merama metnê hûr bibe.

Feqî di menzûmeya Kela Dimdimê da temaya sereke di serê vegêranê da kifş dike. Esil dema ku xwîner bixwîne dê di serî da vê ferq neke. Lê dema pê da biçê û bigihêje dawîyê bi rahetî dê tê bigihêje ku gotar, metafor, karakterîzasyon, teswîr û gelek hêmanên din ên vegêranê li dor wê temayê hatine honandin. Em dikarin bibêjin temaya ku Feqî xwestiye di vê menzûmeyê da derxîne pêş dîn û bawerî ye. Feqî di nav vê temayê da xala ku xwestiye balê bikêşe ser qebûlnekirina mezheba 'Eceman e. Vê yekê di serî da bi gaziyeke wiha destnîşan dike:

Helal kiriye Tahayê
 Mezhebê we bi kêr nayê
 Em dimrin nayêne rayê
 Axret xwoştir e ji dinyayê
 Qeda li dinyayê bikevî
 Dê rûreş bin li nik Nebî
 Qebûl nekin vî mezhebî
 Hemiyan go: "Bila ve bî"
 (Feqîyê Teyran, 2014: 149)

Piştî vê gaziye Feqî mezheba ku divê ji bo wê bikoşin û dev jê bernedin jî bi van bendan destnîşan dike:

Hemiyay rayek vekir
Go aferîn ehda te kir
Avêtin tac qebûl nekir
Li ser xatira Ebû Bekir
Li ser xatira 'Umer e
Di rêya Pêxember e
Xwe bikin ker bi ker e
Rûspî bin da di mehşer e
(Feqîyê Teyran, 2014: 149-150)

Meriv ji van bendan têdigihêje ku ayîn ayîna Îslamê ye û mezheba ku Feqî destnîşan kiriye jî sunîti ye. Çimkî Ebûbekir û 'Umer du xelîfeyên Îslamê yên pêşîn in ku ji hêla şîmezheban ve nayêne qebûl kirin û ji hêla sunîmezheban jî bi hurmet û minet tînin bibîranîn. Jixwe di dewama vegêranê da bi pênasêya 'Ecem û gelek teswîrên din vê temaya xwe xurttir dike. Çimkî 'Ecem navdanîneke sinîyan e ji bo mîletên şîmezheb an jî yên derveyî sinîyan.

Weku bingeh li ser vê temayê Feqî sê temayên din dixwaze ji bo xwîneran veguhêze ku yek jê şehîdbûn e, ya duyem dilsozî û fedakarî ye, ya sêyem jî xîret û hemaset e. Ev her sê temayên têrker bi temamî li dor temaya sereke hatine sêwirandin. Çimkî li gorî Feqî ew kesê ku dev ji mezhebê xwe bernede û ji bo wê şer bike û bimire dê bibe şehîd. Em vê nêzîkbûnê hem di bendên serî da hem jî di bendên dawî yê menzûmeyê da dibînin ku ji serî û dawî du bendên mînak wiha ne:

Rûspîtiyê di mehşer kin
Hernê wan ker bi ker kin
Bi gotina Pêxember kin
Şehîd bin dinê terk kin
(Feqîyê Teyran, 2014: 150)

...

Şehîd bûn çûn ji Xwedê ra
Ev renga govend gêra
Xan û ev xelqê wê ra
Beheşt û hûrî jê ra
(Feqîyê Teyran, 2014: 158)

Esil ne tenê di serî û dawîyê da di gelek bendên navê da jî Feqî temaya şehîdbûnê dubare dike. Feqî hem dixwaze bi vê yekê heqanîyeta mezheba Xan û ehlê kelehê nîşan bide hem jî di motîvasyona micadeleyê da şehîd-

bûn mertebeyeke gelek bilind e ku meriv bo wê mertebeyê dikare dinê bi temamî biterikîne.

Helbet Feqî di çarçoveya têkoşîna mezhebê da balê dikêşe ser temaya dilsozî û fedakariyê jî. Dema ku qala Xanê Zêrînzende, Xan Ebdalê Mukrî, ehlê Kela Dimdimê û ehlê Botan û Mîrê Botanê dike bi teswîrên gelek zelal dilsozî û fedakariya wan a di rêya têkoşîna mezheba wan da jî nîşan dide. Em dikarin van bendên jêr weku nimûne nîşan bidin:

Zêr û xil'et da wan e
Kamil ku bû dîwan e
Go: "Her çî biîman e
Subhê werne meydan e
Sibhê roja şeran e
Bikne axir zeman e
Dest li singiyan dane
Serê me di qebda Xan e
(Feqîyê Teyran, 2014: 150)

Dîsa di dewama vegêranê da dema ku qala neçarbûna şerê rûbirû yan jî man û nemanê dike derbarê biryara wan a qahîm da wiha dibêje:

Heram kirin birestin
Rabûn û çek vebestin
Destûr ji hev dixwestin
Sitîyan qedem şikestin
(Feqîyê Teyran, 2014: 154)

Yek ji wan temayên ku Feqî di seranserê menzûmeyê da derdixe pêş bêguman xîret û hemaseta Xan û mitefiq û ehlê wî ne. Di vê babetê da dema ku behsa Xan Ebdalê Mukrî dike wiha dibêje:

Hûn binêrin li Xan e
Çi hîkmet pehlewan e
Rom nayêne di han e
Xîretkarê mêran e
(Feqîyê Teyran, 2014: 153)

...

Kesê ku lê ev nav bî
Îlla ku Xan Ebdal bî
Şerm e ku ew zirav bî

Xetma vî ne tamam bî
(Feqîyê Teyran, 2014: 154)

Dîsa dema ku Xan û ehlê xwe bi 'Eceman ra dest bi şerê rûbirû dikin,
Feqî serê vî şerî wiha teswîr dike:

Çi dibên metn û niwişt e?
Wan şêran zend vemişt e
Qebdê şîran herişt e
Çûne cihê duqişte
Çûn û jê rû bi rû bûn
Ejder qewî bi sû bûn
Betlê duhê li kû bûn!
Şerê duhê qet çî bûn?
(Feqîyê Teyran, 2014: 155)

Li vir Feqî hem dixwaze wê tevger û heytehola şer bi peyv û teswîran zindî bike di çavê xwîner da hem jî di ber da xîret û hemaseta Xan û ehlê wî nîşan bide ku ji bo parastina mezheb û dînê xwe yê heq li beramberî kafiran bi çî tewrî ne. Weku me gotî dengê şer, wêrekî, canfidayî, şîrçeşîrqa şûr, mortal û tifingan di seranserê menzûmeyê da xwe dide der û Feqî vê yekê bi xwîner dide hîskirin. Loma ev bixwe jî dibe temayeke sereke an jî têrker a metnê.

Feqî di seranserê menzûmeyê da ji çarçoveya micadeleya bo mezhebê heq derneketiye û her li dora wê temayê metafor û teswîrên xwe sêwirandine. Li gorî me Feqî bi zanetî jî vê nêrînê dernekeftiye. Ev nêrîn an ya şexsê Feqî bixwe bûye yan jî ya hamîyê wî Xan Ebdalê Bohtî bûye. Çimkî em dizanin ku di wê serdemê da Kurd bi piranî sunî ne û herçiqas li gorî serdeman di helwesta wan da guherîn çêbûbe jî bêtir terefgirên nêrîna sunî bûne xisûsen di dijmintiya Sefewîyan da. Helbet em pê dizanin ku wê demê mîrektîya Botan digel Osmanîyan mutefiq e û nêrîna serdest a wê serdemê jî ev firqiyeta mezheban e. Herweha polîtîkayên Safewîyan ên şîitîyê û qirkirina wan a Kurdan a ji ber sunîbûna wan (bi taybetî Kurdên Mukrî) a wê serdemê nîşaneyêke vê nêrîn û helwestê ye. Yanî Feqî berevajî varyantên gelêrî piçik amaje bi Kurdbûn û Kurdayetîya Xan û ehlê wî nekiriye û wê temayê di menzûmeyê xwe da nîşan nedaye. Digel ku em dizanin Feqî yan jî Xan Ebdalê Botî vê meseleyê ji nav xelkê bihîstine jî. Çimkî di varyantên gelêrî da herçiqas dîn û bawerî (cudatiya mezheban) weku temayeke têrker xuya bûbe jî berevajî menzûmeyê Feqî, nebûye temaya sereke ya vegêranan. Ev xal bixwe jî ferkeqe mezin e di navbera menzûmeyê Feqî û varyantên gelêrî yên Kela Dimdimê da.

Dema ku em temayên di varyantên gelêrî da dinêrin kê m û zêde weku Yaşar Kaplan (2019: 34-50) jî destnîşankirî²⁶ ji şeş temayan pêk tê. Ev tema weku kurdîni û welatparêzi, dilsozi û xîyanet, dîn û bawerî, jin û namûs, ray û tedbîr, xîret û hemaset in. Di serî da divê meriv destnîşan bike ku temaya kurdîni û welatparêzi, xîyanet, ray û tedbîr û qismen jî jin û namûs di menzûmeya Feqî da tune. Helbet ji nav van kurdîni û welatparêzi û xîyanet gelek giring in ku bi hev ve bestî ne jî. Dîsa di nav van şeş temayan da temaya sereke ya ku di varyantên gelêrî da derdikeve pêş kurdîni û welatparêzi ye. Her pênc temayên din di eslê xwe da temayên têrker ên li derdora temaya sereke ne. Yanî çawa di menzûmeya Feqî da dîn û bawerî temaya sereke bû û yê din têrker bûn, di varyantên gelêrî da jî rewş bi siklê destnîşankirî ye. Loma hemû temayên din ji bo xurtkirina temaya sereke hatine sêwirandin. Di varyantên gelêrî da vegêran her tim tê li ser avakirina welatekî serbixwe ya Xanê Zêrîndest (Xanê Kurdan), hesûdî û timahiya 'Eceman a li Xanê Kurdan, qebûlnekirina bindestiyê ya Xan û parastina navê Kurdîniyê weku şerefek li dijî Şah Ebbasê Sefewî tîr dibe. Loma dilsoziya Xan Ebdalê Mukrî û ehlê Kela Dimdimê, fedakarî û dilsoziya jinan û parastina namûsa xwe ji 'Eceman, xîret û dilêriya ku tê nîşandan, ray û tedbîrên ku tîr girtin bi giştî li gorî nêriya temaya sereke teşe digirin. Heta dîn û bawerî di vê çarçoveyê da weku xetêke cudaker a herdu miletan û xayîntî jî zirara herî mezin a di nav Kurdan da û heta tekane rêya piştîkên a li ser Kurdan tê nîşandan. Ev helwest û nêrin di varyanta devkî ya herî kevin (a Prym û Socin) da jî wisan e û di varyanta vê dawiyê (a Yaşar Kaplan) da jî wisan e. Loma li gorî me ji roja ku ev destan di nav xelkî da belav bûyî jî bi vê helwestê bû û haya Feqî jî ji vê hebû. Heta em dikarin lê zêde bikin û bibêjin ji hêla nêrin û helwestê ve dîsa vegêrana herî nêzikî kronîkên tarîxê jî dîsa varyantên gelêrî ne.

Li dor van nêriyan weku şîroveyek jî em dikarin bibêjin ger Feqî vê menzûmeyê bêtir bi helwest û nêriya varyantên gelêrî honaba, mimkûn bû ku berî Ehmedê Xanî dê bûbûya remzeke nêriya neteweperwer li cem Kurdan. Çimkî babet û temaya vê menzûmeyê û heta rastîya tarîxî ya vê rûdanê ji bo helwest û nêrineke wiha pir guncav bû.

Encam

Rûdaneke tarîxî, çar kronîkên tarîxê yê ku vê rûdanê neqil kirine, menzûmeya klasîk a ji hêla şa'irekî Kurdan ve hatiye nivîsîn û bi dehan varyantên gelêrî yê ku ji sedsalan bêtir e tîr berhevkerin û tomakirin li ber

26 Ji bo agahî û şîroveyan bêtir li xebata Kaplan binêrin. Ji ber ku wî bi berfirehî qal kiriye em ê li vir tenê di çarçoveya berawirdkirina menzûmeya Feqî da çend kelaman bibêjin û ji bo hûrgiliyan temayên varyantên gelêrî berê we bidine xebata navborî ya Kaplan.

destê me ne. Ji vê yekê jî kifş e ku karîgerîya vê rûdanê bi qasî ku hatiye neqilkirin hebûye. Kêm nimûneyên bi vî rengî hene di nav çanda nivîskî û devkî ya Kurdan da. Xisûsen di berawirdkirina du vegêranên vê rûdanê da ku yek a nivîskî ya Feqîyê Teyran e û ya din jî du varyantên gelêrî ne, hin encamên bi destê me ketin ev in:

Menzûmeya Feqî herçiqas di bin karîgerîya varyantên gelêrî da mabe jî weku formeke nivîskî bi teşeyeke cuda û bi mudaxale û destkarîya nivîskarekî/şa'irekî bûye metneke cuda.

Ji hêla hebûn û hejmara karakteran ve zêde ferq tunebe jî ji aliyê karakterîzasyona wan da ferq heye. Mesela herçiqas lehengê sereke Xanê Zêrîndest be jî bi însiyatîfa Feqî kifş e ku di menzûmeya wê da qest ji Xan bêtir Xan Ebdalê Mukrî ye. Di menzûmeya Feqî da Xan parêzvanê mezheba heq e di varyantên gelêrî da Xan parêzvanê Kurdan û welatê wan e.

Ji hêla zincîreya rûdanê ve herçiqas herdu vegêran jî bi awayekî kronolojîk rêz bûbin jî ji aliyê sekansan û ristina vegêranê ve ferqeke eyan heye. Nêzî sê sekansên di varyantên gelêrî da di menzûmeya Feqî da tunene. Ev sekansên ku bêtir bi motîfên gelêrî di varyantên gelêrî da hatine honandin di menzûmeya Feqî da tunene û ev jî dide kifşê ku Feqî formeke nû daye vegêranê. An jî dema rûdana ku bihîstî derbasî nivîsê kiriye heya jê hatiye ji motîfên gelêrî xalî kiriye.

Ji aliyê dema rûdanê ve di her du vegêranan da jî şêlûbûn û nezelalîyek heye. Li gorî binyata vegêranên gelêrî ev rewş ji bo varyantên gelêrî asayî ye. Lêbelê di menzûmeya Feqî da ev rewş ne rewşeke asayî ye. Çimkî di vegêranên nivîskî da û bîlxasse di rûdanên bi vî rengî da divê dem bi şikilekî hatiba dîyarkirin. Lêbelê dîyar nekiriye û loma em dibêjin ku Feqî di bin karîgerîya vegêrana gelêrî da maye ji vî aliyê ve. Ji hêla dema vegêranê ve jî ferqeke şênber di navbera herdu vegêranan da tunene. Dawîya dawî her du vegêran jî rûdaneke nêzî salekê di çend rêzikan da vedigêrin.

Cihê rûdanê di her du vegêranan da jî Kela Dimdimê ye. Lê ferqek heye ku ew jî di varyantên gelêrî da ji bilî Kela Dimdimê cihê jidayîkbûna Xan, cihê Şah û gelek dekorên din hatine veguhastin û di menzûmeya Feqî da peyda nabin. Ev jî nîşanî me dide ku zûrbûna Feqî li ser cihê sereke û rûdana li wir e. An jî zûrbûna wî li ser wî cihî ye ku bêtir Xan Ebdalê Mukrî lê xuya bûye. Ji aliyê cihê vegêranê ve varyantên gelêrî ne kifş in. Lêbelê di menzûmeya Feqî da eyan e. Ev jî nîşaneyê hêla nivîskî ya metna Feqî ye. Çimkî ew menzûme ji destê şa'irekî derkeftiye ku cihê wî û jiyana wî kifşe ye.

Belkî xala herî giring û balkêş jî temayên sereke ne ku ev ferqeke gelek eyan e di navbera herdu vegêranan da. Di menzûmeya Feqî da temaya sereke dîn û bawerî ye di varyantên gelêrî da temaya sereke kurdînî û welatparêzî bûye. Ev du temayên temsîlkar in ku yek aliyê civakî yê dîndar temsîl dike ya din jî aliyê sekûler ê civakê temsîl dike. Feqî aliyê civakê yê dîndar hîlbijartiyê û di vê hîlbijartinê da pir mimkûn e ku helwest û serborîya Feqî ya dîndarî, mutesewifî û sunnîtiyê hebe. Lê pirseke wiha jî li gorî me divê her bê pirsîn: Gelo hamiyê Feqî yê ku pê ev menzûme da nivîsandin digel ku mîrekî Kurdan bû jî çima qet di vê menzûmeyê da amaje bi Kurdbûna Xanê Zêrînzende an jî Xan Ebdalê Mukrî nedaye kirin?

Çavkanî

Açar, Cafer (2019) *Safevi Kroniklerinde Dımdım Kalesi Kuşatması ve Emir Han Bradosti*, İstanbul: Avesta.

Adak, Abdurrahman (2013) *Destpêka Edebiyata Kurdîya Klasîk*, İstanbul: Nûbihar.

Adak, Abdurrahman. Baluken, Yusuf & Acar, Hayrullah (2014) "Gora Feqiyê Teyran", *Nûbihar Akademî*, c. 1, j. 1, 111-120.

Aykaç Yakup (2022) "Miks: Navendeke Dîrokî, 'İlmî, Tesewifî û Edebî", *The Journal of Mesopotamian Studies*, 7 (1), 67-102.

Aykaç, Yakup (2020) *Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj (1514-1846)*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Aykaç, Yakup (2021) "Danasîn û Tewsîfa Mecmû'eyên Helbestan di Koleksiyona Aleksandre Jaba de", *Kurdiyat*, 4, 23-60.

Azîzan, Herekol (1941) "Klasîkên Me – An Şahir û Edîbên Me ên Kevin", *Hawar, Firat Cewerî (amd.)*, j. 33., Çiriya Pêşîn, , 6-14.

Baluken, Yusuf (2021) "Aşiretten Mîrliğe Buxtîler", *Kurdiname*, no. 4, 46-66.

Celîl, Ordîxanê (2001) *Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım*, Stembol: Avesta.

Çelebi, Evliyâ (2010) *Günümüz Türkçesiyle Evliyâ Çelebi Seyahatnâmesi*, 4. Kitap 1. Cilt, (Haz.) Seyit Ali Kahraman & Yücel Dağlı, İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Eyûb Hesên, Nizar (2022) "Nameya Sultanê Osmanî Bo Xanê Lepzêrîn 1609", *Govara Rûgeh*, hejmar: 14, 17-22.

Feqiyê Teyran, (2014) *Divan∞Dîwan*, Kadri Yıldırım (çev.), Ankara:

Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Genette, Gérard (2011) *Anlatının Söylemi: Yöntem Hakkında Bir Deneme*, F. B. Aydar (çev.), İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.

Hassanpour, Amir (1995) "Dimdim", *Encyclopaedia Iranica*, Vol. VII, Fasc. 4, 404-405.

Kaplan, Yaşar (2019) *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn*, İstanbul: Nûbihar.

Kıran, Zeynel & Ayşe Eziler Kıran (2007) *Yazınsal Okuma Süreçleri*, (3. Baskı), Ankara: Seçkin Yayıncılık.

Prym, Eugen & Socin, Albert (1890) *Kurdische Sammlungen*, St. Petersburg: Commissionäre der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften.

Resûl, İzzeddîn Mistefa (1998) "Jıyan û Berhemên Feqiyê Teyran", *Mikaîl Canpolat (wer.)*, War, hej. 3, 82-96.

Ryan, Marie Laure (2009) "Space", P. Hühn et al. (eds.). *Handbook of Narratology*, Berlin/New York: Walter de Gruyter, 420-433.

Sadinî, M. Xalid (2012) *Feqiyê Teyran: Jıyan Berhem û Helbestên Wî*, Çapa 6em, İstanbul: Nûbihar.

Sadinî, M. Xalid (2013) *Feqiyê Teyran'ın Mezartaşı Bulundu*, İlke Haber, <https://www.ilkehaber.com/haber/feqiye-teyranin-mezartasi-bulundu-27816.htm> (29.04.2022).

Taşkın, Hanefi (2016) "Mela Haşimê Miksî û Dîtina Terîq-un Necata Wî", *Nûbihar*, sal: 24, cild: 20, hejmar: 137, 66-71.

Thompson, S. (1955-1958) *Motif-Index of Folk-Literature: A Classification of Narrative Elements in Folktales, Ballads, Myths, Fables, Mediaeval Romances, Exempla, Fabliaux, Jest-Books, and Local Legends*, (Revised and Enlarged Edition), Bloomington: Indiana University Press.

Walî, Zuhre (1379/2000) *Heft der Qelemrûyê Temeddon ve Ferhengê Beşerî*, Tehran: Esatîr.

Yıldırım, Kadri (2014) "Feqiyê Teyran'ın Hayatı Eserleri Görüşleri ve Yunus Emre ile Mukayesesi", *Feqiyê Teyran, Divan∞Dîwan*, Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.

Yıldız, Ayhan (2015) *Qewlê Hespê Reş (Metn û Lêkolîn)*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.

Yûsif, Ebdurreqîb (2012) *Dîwana Kurmancî Şairên Klasîk ên Kurd*, Stenbol: Dîwan.

Zîlan, Reşo (2015) *“Lêkolînek li ser Kela Dimdimê”*, Ramazan Pertev (edt.), *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Stembol: Avesta, 189-220.*

Çavkanîyên Destnivîs

Koleksiyona Aleksandre Jaba, *Klasor no: Kurd 26., wr. 15a-18a.*

Koleksiyona Aleksandre Jaba, *Klasor no: Kurd 36., wr. 33a-36b.*